# DAWUD Û GOLYAT


Dijminên Îsraêl ordîya xwe komkirin, da ku şêr bikin.
Ew li wî alîyê gelî bûn, lê ordîya Îsraêl li vî alîyê gelî bû.
(1 Samoyêl 7:1,3)



Ordîya kîjan miletî li vî alîyî bû?

…………………………………………………….

Ji nav leşkerên dijminan mirovekî bi qewet rabû, navê wî Golyat bû. Bejna wî nêzîkî sê metreyan bû, li ser serê wî jî kumzirx hebû, zirxê ji tonc û hesin jî lê bû. Giranbûniya wî zirxî dora şêst kîloyan bû. Destiyê rima wî wek singê destgehê konan bû. Serê rima wî nêzîkî heft kîlo hesin bû. Xulamê wî yê ku martalê wî hildigirt di pêşiya wî de diçû. (1 Samoyêl 17:4-7)



Navê wî mirovê bihêz çi bû, yê ku di nav leskerên dijminan de bû?

………………………………………………………………………………………….

Ew hat, rawesta, gazî kir û ji ordîya Îsraêl re got: «Hûn çima bi me re hatine şêr? Ma ez ne Filistînî me,  hûn jî ne Îbraniyên, xulamên  Şawûl in? Ji bo xwe zilamekî bibijêrin, da ku bi min re şêr bike. Heke ew li min bixe û min bikuje, emê bibin xulamên we, lê heke ez biserkevim û wî bikujim, hûnê bibin xulamên me.»Wî ser ve zêdekir û got: «Îro ez ji ordîya Îsraêl re meydanê dixwînim. Ji nav xwe zilamekî bişînin, ku em şêr bikin!»  (1 Samoyêl 17:8-10)



Golyat ji bo çi ji ordiya Îsraêl xwest ku ji nav xwe zilamekî bibijêrin ?

………………………………………………………………………………………

Gava Şawûl, padişahê Îsraêl û leskerên wî ev yek bihîstin ji tirsa lerizîn.
Dawud ji Şawûl re got: «Bila ji tirsa vi zilamî dilê tu kesî sist ne be.
Xulamê te wê here û bi wîyê Filistîn re şêr bike». Şawûl ji Dawud re got:
«Belkî tu nikarî bi wî re şêrr bikî, çimkî tu xort î, lê ew ji zaroktîya xwe
ve zilamê şêrr e».(1 Samoyêl 17:11,32,33)



Dawud çi ji Şawûl re got?

.........................................................

Dawud ji Şawûl re got: «Xulamê te gelek caran pezê bavê xwe diçêrand. Gava şêr an hirç dihatin û pezek dibirin, ez li pey wan diketim, min li wan dixist û pez ji devê wan derdixist. Lê çaxê ew li ber min radibûn min çena wan digirt û li wan dixist ew dikuştin. Wusa jî ezê bi serê vîyê nepak bikim, yê ku meydanê ji ordîya Xwedê re dixwîne. Ew Xudanê ku ez ji nav lapên şêr û hirçê xilaz kirime, wê min ji nav destên yê Filistînî jî xilaz bike». (1 Samoyêl 17:34-37)



Çima Dawud bawer dikir, ku Xwedê wê wî ji destên vîyê nepak xilaz bike?

..........................................................................................................

Şawûl ji Dawud re got: «Here, bila Xwedê bi te re be».
Îcar Şawûl çekên xwe dan Dawud, lê belê Dawud hînî wan nebûbû. Wî ji Şawûl re got: «Ez bi van nikarim bi rêve herim, çimkî ez hînî wan nebûme. Ezê bi dar û berkanî herim». (1 Samoyêl 17:38-39)



Şawûl xwest ku çi bide Dawud?..........................................

Dawud şivdarê xwe girt dest xwe, ji ber lêva çemekî jî pênc kevirên bestan bejartin û xistin xwêdanka xwe. Berkaniyê wî di destê wî de bû. Ew ber bi Golyat ve çû. Golyat jî ber bi Dawud ve hat. Xulamê wî yê ku mertalê wî hidigirt li pêşiya wî dihat.
(1. Samoyêl 17:40-41)



Dawud çend kevirên bestan bejartin?........................

Golyat nêrî, dît ku Dawud tê. Wî Dawud bi tiştekî hesêb nekir, çimkî xortekî ciwan bû. Golyat ji wî re got: »Ma tu wusa têyî? Ma ez se me ku tu bi dar têyî ser min?» Û wî bi xwedayên xwe nifir li Dawud kirin û got: «Ezê laşê te bidim teyrên ezmên û heywanên çolê». Dawud bersiv da: «Tu bi rim, mertal û şûr têyî ser min, lê ez bi navê Xudanê ordîya Îsraêl têm ser te. Xudan wê îro te bide destê min».
(1 Samoyêl 17:42-46)



Dawud bi çi li ber Golyat rabû? ...............................

Golyat rabû û nêzîkî Dawud dibû û Dawud jî ber bi wî ve çû. Wî destê xwe avêt xwedanka xwe û kevirek jê derxist û bi berkanî veweşand, li eniya Golyat xist û kevir çû di eniya Golyat de û ew ket erdê. Dawud çû ser wî û bi şûrê wî serê wî jê kir.
(1 Samoyêl 17:48-50)



Dawud bi çi dijmin xist erdê û kuşt?....................................

Gava Filistiyan dît, ku pêlawanê wan mir, reviyan. Leşkerên Îsraêl bi dengekî bilind kirin qirîn û li pey wan ketin. Dawud di çavê Şawûl û hemû xulamên wî de mezin bû. Çaxê ji şêr edî vegerîyan, di hemû komelên Îsraêl de jin bi arbanan û bêliteyan çûn pêşiya Şawûl û digotin: «Şawûl lêxist hezarên wan lê Dawud lêxist dehhezarên wan». Bi vî awayî pesnê Dawud bêtir bû. (1 Samoyêl 17:51-52, 18:5-7)



Dawud li ber çavê Şawûl û hemû xulamên wî çawa bû?

........................................................................................................